

**Ji bo dêûbavên, zarokên wan  
diçin hêlînên Berlinê**

05.05.2021

**Agahiyên ji bo dêûbavan ên li ser berfirehkirina xebata lênêrîna zarokan a acîl a li hêlînan**

Dêûbavên hêja,  
Stî û mîrzayên rêzdar,

li gorî talîmatên Rêzîknameya Tedbîrên Kêmkirina SARS-CoV-2ê navendên lênêrîna zarokan a danê rojê û hêlînên zarokan ên danê rojê yê li Berlinê, girêdayî xebata acîl, wekî berê niha girtî ne.

Em kêfxweş in, ku li Berlinê ev rêjeya-7-rojan dadikeve û bûyerên enfeksiyonê yê li hêlînên zarokan, her wisa li gel zarokan jî, bi berdewamî kêm dibin. Ev pêşketina erênî êdî derfetê diafirîne, ku gavên din ên ji bo vekirina xebata hêlîna zarokan werin avêtin.

Ji ber vê yekê Senatoya Berlinê di civîna xwe ya 04.05.2021an de biryar stand, ku **piştî 10.05.2021an tevahiya zarokên, ku çarsaliya xwe bi temamî tije kirine, ji xizmeta lênêrîna acîl sûdê bigirin. Ji bo vê yekê ne pêwîst e, ku pêdiviyeye taybet û acîl a lênêrîna zarokan hebe.**

**Senato wekî din jî dinêre, ka gavên din ên ji bo vekirina hêlînên zarokan pêkan in, da ku di demeke nêzîk de tevahiya malbatên li Berlinê û zarokên wan dîsa bikaribin ji xizmeta lênêrîna zarokan sûdê bigirin. Ji bo vê yekê wekî berê niha jî pêwîst e, bûyerên enfeksiyonê hevseng bimînin an jî kêmbibin.**

Ji bo ku şertên bingehîn ên ji bo xebata acîl a ewle saz bikin, em piştgiriya didin navendan û zarokên li wan deran ji xizmeta lînerîna sûdê digirin, bi taybet bi riya derfeta derzîkirina xebatkaran. Materyalên parastîna, derfetên testkirinê û derfeta xizmetên lînerîna zarokan a di komên biçûk û sabît de.

Ji bo ku her çiqas semptomên wan ên nexweşiyê yê sivik hebin jî, zarok bikaribin dîsa jî herin hêlîna zarokan, derfeta pêşkêşkirina encama negatîv a testê yan jî daxuyaniya xweser a li ser vê yekê heye. Ji bo ku were piştrastkirin, ku enfeksiyona koronayê pêk nehatiye, têrê dike, ku testeke negatîv ji bo carekê were pêşkêşkirin. Ne pêwîst e, ku hûn her roj encameke negatîv a testê pêşkêş bikin an jî her roj testa xwe bikin.

Me ji bo zarokên li hêlînan zarokan bi giştî 500.000 testên xweser dane hêlînan, da ku ew jî van testan radestî dêûbavan bikin. Ji kerema xwe re bala xwe bidinê:

- Bidestxistina testan ji aliyê we ve pêk tê û ne ji aliyê xebatkarê hêlîna zarokan.
- Gava pêdivî pê hebe, ev test dê radestî we werin kirin, da ku hûn **li gorî pêdiviyê** testa zarokê/a xwe bikin.

Gava testek radestî we were kirin, em bi awayekî zelal ji we rica dikin, ku hûn li gorî vîdeoya hînkirinê ya Rêveberiya Senatoya Perwerdehî, Ciwan û Malbatan a li ser bikaranîna testan tevbigerin, da ku pêşî li şaşiyên bikaranîna were girtin. Hûn dikarin vê yekê li ser vê derê bibînin. [https://www.berlin.de/sen/bjf/corona/tests/#faq\\_1\\_7](https://www.berlin.de/sen/bjf/corona/tests/#faq_1_7)

Gava nexweşiyên kronîk hebin, ku di nav de her wisa semptomên sermagirtinê/nexweşiyê cî digirin, dubarekirina testê tenê ji ber vê sedemê ne pêwîst e. Lê belê divê ji bo vê yekê Attesteke ji aliyê doktorî ve were pêşkêşkirin, ku pêşnexweşiyê piştrast dike, da ku serdana hêlîna zarokan pêkan be.

Di hefteyên borî de bi awayekî bi rêkûpêkî pirsên li ser testa-tifê-a-xweser dikevin destê me. Ji ber ku Enstîtuya Federal a Derman û Berhemên Tibî destûrê nedaye vê yekê, loma testên bi vî rengî ji aliyê me ve radestî hêlînan zarokan nehatine kirin.

**Dêûbavên hêja**, em pê dizanin, ku girtina hêlînan zarokan ên danê rojê bi taybet barê van malbatên li Berlinê giran dike, ku her çiqas lînerîna acîl gelek berfireh bûbe jî, nikarin sûdê ji xizmeta lînerîna zarokan bigirin.

Hûn pê ewle bin, ku Senato dinêre, ka gavên berfirehtir dikarin werin avêtin, da ku girtina hêlînan zarokan ên Berlinê, ku xizmeta lînerîna acîl didin, di demeke herî nêz de rake, ji bo ku tevahiya malbatên li Berlinê û zarokên wan sûdê ji vê xizmetê bigirin.

Li gel silavên germ  
Peywirdar  
Holger Schulze  
Rêveberê Daîreya V  
A Malbat û Perwerdehiya Zarokên Biçûk